

Şi'ra Muweşşeh ya Şêx Tahirê Şûşî û Hunerên Nuh Yên Edebî

Nurettin Ertekin¹

Şeyh Tahir-i Şuşî'nin Muvaşşah Şiiri ve Yeni Edebî Sanatlar

Öz

Bazı şairler şiirlerinde edebi sanatlara dayalı uygulamalara, her şairin şiirlerinde görülmeyecek şiir tarz ve türlerine yer vermişlerdir. Muvaşşah tarzı şiir de şairler tarafından ender kullanılan edebi sanatlardan birisidir. Muvaşşahın günümüzde akrostiş şeklinde ifade edilmesinden dolayı sadece mısra başlarındaki harflerden isim çıkarma sanatı olarak algılandığı malumdur. Halbuki klasik şiirdeki örneklerde şiirin harflerinden faydalanmanın muvaşşahın bir biçimi olduğu, daha çok görsele dayanan kuş, ağaç, daire ve kare şeklinde muvaşşahlardan da faydalandığı görülmüştür. Bu çalışma Şeyh Tahir Şuşî'nin "Gönül Mumu" adı verilen muvaşşah şiirini incelemektedir. Bu bağlamda, çalışmanın sorusu; klasik Kürt edebiyatının muvaşşah şiir türüne katkı sağlayıp sağlamadığı ve klasik Kürt şairlerin yeni edebi sanatlar üretip üretmediğidir. Metod olarak literatür taraması yöntemi kullanılan bu çalışmanın çerçevesi Şeyh Tahir-i Şuşî'nin "Gönül Mumu" adı verilen muvaşşah şiiri ile sınırlandırılmıştır. Sonuç olarak gördük ki; Şeyh Tahir-i Şuşî'nin "Gönül Mumu" adlı şiirin yeni bir muvaşşah şiir türü olduğu ve bu şiirde belagat kitaplarında çok az rastlanan veya hiç rastlanmayan bazı edebi sanatların yer aldığı tespit edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Şiir, Muvaşşah, Mülemma, Edebî Sanatlar, Şeyh Tahir-i Şuşî, Gönül Mumu.

Sheikh Tahir Shushi's Muvashshah Poetry and New Literary Arts

Abstract

Some poets used literary arts in their poems, poetry styles and genres that are not seen in every poet's poems. Muvashshah style poetry is one of the literary arts rarely used by poets. It is well known that today Muvashshah

¹ Dr., Hakkari Üniversitesi, nurettin.ertekin@hotmail.com, ORCID: [0000-0003-2744-0447](https://orcid.org/0000-0003-2744-0447).

Makale Gönderilme Tarihi / Article Submission Date: 01.08.2024

Makale Kabul Tarihi / Article Acceptance Date: 07.11.2024

Yazarlar dergide yayınlanan çalışmalarının telif hakkına sahiptirler ve çalışmalarını [CC BY-NC 4.0](https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/) lisansı altında açık erişim olarak yayımlanmaktadır.

Authors own the copyright of their work published in the journal and their work is published as open access under the [CC BY-NC 4.0](https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/) license.

is perceived only as the art of extracting names from the letters at the beginning of the lines because it is expressed in the form of acrostic. However, examples in classical poetry show that utilizing the letters of the poem is a form of *muwashshah*, and that *muwashshahs* in the form of birds, trees, circles and squares, which are more based on visuals, are also used. This study analyzes Sheikh Tahir Shushi's *muwashshah* poem called "The Candle of the Heart". In this context, the question of the study is whether classical Kurdish literature has contributed to the *muwashshah* poetry genre and whether classical Kurdish poets have produced new literary arts. The framework of this study, which uses the literature review method as a method, is limited to Sheikh Tahir Shushi's *muwashshah* poem called "The Candle of the Heart". As a result, we found that Sheikh Tahir Shushi's poem "The Mumu of the Heart" is a new type of *muwashshah* poem and it contains some literary arts that are rarely or never found in the books of rhetoric.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Poetry, *Muwashshah*, Mulemma, Literary Arts, Sheikh Tahir Shushi, The Candle of the Heart.

Kurte

Carînan şair di şî'rên xwe de berê xwe didin hinek hunerên edebî ku bi wê şêwe û bi wê cureyê di şî'rên şa'îrên dîtir de nayêne dîtîn. Şî'rên muweşşeh jî yek ji wan hunerên edebî ye ku ji teref kêma şa'îran ve hatiye bikaranîn. Muweşşeh ji ber ku weke şî'ra akrostîş dihê bilêvkerin, bes weke ji herfên serê misrayan derxistina navan dihê famkirin. Lê di mînakên edebiyata klasîk de sûdwergerîna ji herfên şî'rê cureyeke muweşşehê ye û ji muweşşehên dîtbarî yên weke di şiklên balindeyan û daran, muweşşehên çargoşe û grover jî sûd hatiye wergerîtin. Ev xebat şî'ra muweşşeha a Şêx Tahirê Şûşî ya bi navê "Mûma Dîlî" vedikolîne. Li ser vê, pîrsa xebatê ev e; di edebiyata Kurdî ya Klasîk de zêdahî li cureyên şî'ra muweşşeh bûye an nebûye û şa'îrên edebiyata Kurdî ya klasîk hunerên edebî ava kirine an nekirine. Rêbaza xebatê lêgerîna lîteraturê ye û çerçoweya xebatê bi şî'ra muweşşeh a bi navê "Mûma Dîlî" ya Şêx Tahirê Şûşî hatiye sîmordarkirin. Di encamê de hate dîtîn ku; şî'ra Şêx Tahirê Şûşî ya bi navê "Mûma Dîlî" cureyeke nuh ya şî'ra muweşşehê ye û di vê şî'rê de hinek hunerên edebî hatine bikaranîn ku di berhemên rewanbêjîyê de kêma dihên dîtîn an nayên dîtîn.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Şî'r, Muweşşeh, Mulemma', Hunerên Edebî, Şêx Tahirê Şûşî, Mûma Dîlî.

Extended Abstract

Classical literature began with Arabic literature and developed with Persian literature. Persian literature, with its cultural and linguistic characteristics, deeply influenced Turkish, Kurdish, and other neighboring literatures. However, each nation's literature has formed its unique style with its cultural and linguistic features. Looking at the history of literature, we see that the development of literature has been thanks to new methods and concepts introduced to it. Talented and successful poets have made significant contributions to the development of literature by

making changes in literary arts and poetry forms. Therefore, the literature of each nation has contributed to world literature in this way. Sheikh Tahir Shushi is an important poet who introduced new literary arts to poetry and at the same time introduced new forms in classical Kurdish literature. The poem "Heart Candle" by Sheikh Tahir Shushi is a very important poem in this context. This poem is original in terms of its poetic form, muwashshah (acrostic) poetry type, and literary arts, contributing to world literature. In this study, we examined the poem "Heart Candle" by Sheikh Tahir Shushi. After a brief introduction, the first chapter discusses the poet's life and the story of how this poem was obtained. In the second chapter, the poem "Heart Candle" is examined in terms of its form and literary arts. Sheikh Tahir Shushi is a multifaceted personality in Kurdish literature as a scholar, poet, author, calligrapher, and book scribe. He comes from a well-established family with many scholars and intellectuals in its history. His father's name is Mehemed, and his grandfather's name is Sheikh Tahir. He was born in 1917 in the village of Shushe, located in the Behdinan region between Duhok and Akre in today's Iraq. After studying at the important madrasas of the region, Sheikh Tahir served as an imam in various places after obtaining his diploma. He also holds a diploma in the art of calligraphy. Sheikh Tahir died in 1962, and his most important work is "Gulzar- Riyadu'n-Nûr." Sheikh Tahir designed his poem "Heart Candle" in the shape of rose or flower petals. Each petal of the rose forms a verse of the poem. In this way, he wrote a ten-verse poem. The poet placed the letter "L" (ﻝ) in the center of the rose. This letter is a common letter at the beginning of the first and at the end of the last verse. At the top of each petal, three letters are written in bold. These three letters and the "L" (ﻝ) in the center of the rose are common letters at the beginning and end of the words in the verses. At the end of each petal, two letters are written in bold. These two letters form the last two letters of the first verse and the first two letters of the last verse. The poem is written in the "Tavil" meter of Arabic prosody and follows the "Fe'ûlun, Mefa'îlun, Fe'ûlun, Mefa'îlun/Mefa'îlu" pattern. When we examine the poem "Heart Candle" by Sheikh Tahir Shushi in terms of form, we see the following features. The poem is written in the form of a fragment (kita) poem. However, since all the verses begin and end with the letter "L" (ﻝ), it is a "Lami'ye" fragment. Since one verse of the poem is in Kurdish and the other in Arabic, it is a Mulamma (a poem written in two or more languages) fragment. Since this poem is written in the form of an acrostic (muwashshah), it is a muwashshah fragment. In our research, we named this acrostic poem "Rose Muwashshah" because we encountered such a poem for the first time. When we examined the poem in terms of literary arts, we identified the following features. By writing the first four letters of the verses in reverse at the end of the verses, he introduced a new art called "kalb" (reversal of words).

أَمَانٌ وَتَسْلِيمٌ لِرَاحٍ وَفُؤْمِل

ل موما دلێمین تازە شوعلک وهلی هلبو

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
Emanun we teslîmun lî racin we **mûmilî**

By writing the first four letters of the poem in reverse at the end of the poem, he created another form of kalb.

ل موما دلیمن تازه شوعلک و
 ل مجهر هوایین یاری بی لطف و بی میلی
 یوجد الیم من حبیب مجمل
 لیبکی فوادی بالدموع المستسل

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
 Bi wecdin elîmin min hebîbin **mu**cemmelî

Li **mecmer** hewayê yarê bê lutf û bê meylê
 Li yepkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

The poet used these arts in both Arabic and Kurdish. Repetition arts such as Revde (the first letter of the verse being the last letter of the verse), alliteration, and assonance are used intensively. He created a new art called "Reddu's-sedrî île'l-îbtîda".

ل موما دلیمن تازه شوعلک و دلئ هلبو
 ل مجهر هوایین یاری بی لطف و بی میلی
 یوجد الیم من حبیب مجمل
 لیبکی فوادی بالدموع المستسل

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil **bû**
 Bi wecdin elîmin min hebîbin **mu**cemmelî

Li **mecmer** hewayê yarê bê lutf û bê meylê
 Li yepkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

By creating "Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedrî Me'el Qelb", a rarely used art in literary arts, in the letters of the words, he created a new art.

ل موما دلیمن تازه شوعلک و دلئ هلبو
 ل مجهر هوایین یاری بی لطف و بی میلی
 یوجد الیم من حبیب مجمل
 لیبکی فوادی بالدموع المستسل

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
 Bi wecdin elîmin min hebîbin **mu**cemmelî

Li **mecmer** hewayê yarê bê lutf û bê meylê
 Li yepkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

From this study, it emerged that classical Kurdish literature has unique characteristics. The poets of classical Kurdish literature have contributed to classical literature in various ways. According to these characteristics, poetry forms and literary arts should be identified and named. Sheikh Tahir Shushi is an important poet who contributed to classical literature in this way

Destpêk

Edebiyata klasîk, bingeha xwe ji edebiyata ‘Erebî bigire jî geşadana xwe di edebiyata Farsî de derxistiye holê û her miletekî tiştek lê zêde kiriye. Edebiyata Farsî, xwedî raburdûyek dirêj e di nava edebiyatên dinyayê de û yek ji edebiyatên herî kevn dihê jimartin. Hem ji ber geşadana edebiyata klasîk di edebiyata Farsî de, hem ji ber kevnariya edebiyata Farsî û hem ji ber faktorên sîyasî, erdnîgarî, bazirganî û çandî, ziman, çand û edebiyata Farsî li ser ziman, çand û edebiyata neteweyên dîtir di erdnîgariyeke berfireh de karîger bûye. Bêguman, di navbera neteweyên ciyawaz de, nexasim neteweyên ku ji gelek hêlan ve bi hev re têkildar in, peywendî û karîgerîya çand, ziman û edebiyatê bivê nevê ewê hebe.²

Edebiyata Kurdî ya klasîk, edebiyatek e ku ji ber şert û mercên serdema ku rû daye û faktorên dîtir her dem bi edebiyata ‘Erebî û Farsî re meşîya ye. Edebiyata Kurdî ya klasîk, esasen naverok û estetîka xwe ji çanda Îslamê wergirtiye û xasma edebiyata Farsî ya xurt ji xwe re weke mînak pejirandiye û di binê karîgeriya wê de teşe girtiye û mezin bûye. Ji ber vê ji edebiyata ‘Erebî bêtir karîgeriya edebiyata Farsî li ser edebiyata Kurdî ya klasîk berbiçavtir e.

Herçend bingeha edebiyata klasîk edebiyata ‘Erebî be jî, her miletekî reng û rûyê çand, ziman û estetîka xwe daye edebiyatê û bi vî rengî hem di teşeyên nezmê de û hem di hunerên edebî de guherînên mezin derxistine holê. Edebiyata Farsî xezel ji qesîdeyê deranîye û bûye pêşengê vê teşeyê ku êdî bûye teşeyê serbixwe (Şemîsa, 1385). Herweha mesnewî û rûba’î du teşeyên nezmê ne ku pêşî di edebiyata Farsî de derketine qada edebiyatê (Şemîsa, 1374). Dema em li edebiyata Tirkî dinihêrên em dibinin ku du teşeyên nezmê *tuyûx* û *şerqî* li edebiyata klasîk zêde bûne.³

Herweha em dibinin ku di edebiyata her miletekî de li gorî şert û mercên sîyasî, faktorên zimanî û çandî, têgihên edebî hatine pênaskirin. Pênaseyên ku ‘Eraban kirine ji bo edebiyata Farsî, Tirkî û Kurdî, pênaseyên ku Farisan kirine ji bo edebiyata Tirkî û Kurdî, pênaseyên ku Tirkan kirine ji bo edebiyata Kurdî ne guncav in û bil ‘eks.⁴

Di hunerên edebî de jî rewş bi heman şiklî ye. Bi derbasbûna demê, bi zêdebûna şî’r û şa’iran peydepey hunerên edebî zêde bûne. Xasma ji hunerên edebî yên di zanista bedî’ê de guherîn û zêdebûnê bêtir xuya dike. Di eslê xwe de

² Ji bo agahiyên ebrfireh derbarê peywendî û karîgerîya çand, ziman û edebiyatên ciyawaz de bnr: (Zerrînkûb, 1361)

³ Ji bo teşeyên nezmê yên edebiyata Tirkî bnr: (Saraç, 2017)

⁴ Di edebiyata Farsî de ji bo pênaseya mulemme’ê weha hatiye gotin: Edîb ji wê şî’rê re mulemme’ dibêjin ku zimanê ‘Erebî û Farsî bi hev re hatibe bikaranîn. Mesela yek misra ‘Erebî û yek misra Farsî, yan yek an çend malik bi Farsî û yek an çend malik bi ‘Erebî bin (Fesayî, 1380). Ev pênaseya mulemme’ên du zimanî ye. Ji bo mulemme’ên sê zimanî pênaseyê weha hatiye dayin: Musellesat, ji wê şî’rê re tê gotin ku şa’ir di şî’ra xwe de ji sê zimanan an ji du ziman û lehçeyê mehellî sûd wergirtiye (Fesayî, 1380). Weke ji pênaseyan dixuye ji bo şî’rên çar, pênc zimanî pênase nehatiye kirin. Ji bo mulemme’ê jî zimanê Farsî û ‘Erebî weke merc hatiye dayin.

zanista bedî'ê navê xwe ji guherîn û nûkirinê werdigire. Bedî' dihê wateya "şêweya nû" (Me'în, 1381). Şa'iran çi dema di hunerên edebî yên di şikl û lefzê de şêwe û uslûba şa'irên beriya xwe neşopandin, nûjenî ava kirin, hunerên dîtir bi kar anîn, bi qabiliyetên xwe reng û ciwaniyek dane şî'rê, bedî' weke têgih kete edebiyatê.⁵

Şa'irên mahir û xwedî qabiliyet li ser hunerên bedî'ê tevî hunerên dîtir yên rewanbêjîyî û teşeyên nezmê ku di berheman de cih girtine, dikarin guherîna pêk bînin û zêdehîyan li wan bikin. Di dîroka edebiyatê de geşedana edebiyatê bi vî şiklî pêk hatiye.⁶

Edebiyata Kurdî ya klasîk, herçend ji edebiyata 'Erebî sûd wergirtibe û karîgeriya edebiyata Farsî li ser wê xuya be jî, edebiyateke xwedî taybetiyên cuda ye. Helbet sedema cîyawaziya edebiyata Kurdî ya klasîk ji edebiyatên dîtir ziman û çanda Kurdî ye. Şa'ir û edîben Kurd di şî'rên xwe de ji ziman û çanda xwe sûd wergirtine ku ev tiştêkî asayî ye. Ji vê sûdwergirtinê ye ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hem di teşeyên nezmê de û hem di hunerên edebî de cîyawazî dihê dîtir. Û ev cîyawazî di berhemen rewanbêjîyê yên 'Erebî, Farsî û Tirkî de cih nagirin. Eger em navekî taybet li şî'ra Melayê Cizîrî (1570-1640) ya ku hema hema di serê hemû dîwanên wî de cih girtiye û nîviyê xezela yekem ya dîwana Hafizê Şîrazî (w. 792/1390) tê da bi cih kiriye, *newaya mitrib û çengê fixan avête xerçengê*, nekin, emê ji vê şî'rê re çi bibêjin? Yan şî'ra Şêx Ehmedê Xanî (w. 1119/1707) ya ku bi çar zimanan hatiye honandin, *Fate 'umrî fî hewake ya hebîbî kulle hal*, ku em pênaseya mulemme'an li gorî edebiyata Kurdî nehatina nûjenkirin, meyê çi nav lê bikira?⁷ Ev rewş ji bo hunerên edebî jî derbasdar e.

⁵ Ji bo agahiyên Berfireh bnr: (Kedkenî, Suwerê Xeyal Der Şî'rê Farsî, 1372)

⁶ Di dîroka edebiyatê de kesê ku cara pêşî bedî'ê weke beşek ji hunerên edebî nixandiyê, rêgezên wê rave kiriye û beşên wê yên sereke pênase kiriye İbnul-Mu'tez e (w 296/908). Mu'tez, di berhema xwe ya bi navê *Kîtabu'l-Bedî'* de ji bo hunerên weke; İstîa're, Cînas, Tîbaq, Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedî' û el-Mezhebu'l-Kelamî têgihê bedî'ê bikartîne. Piştê dibêje; kesên din jî dikarin hinek hunerên dîtir li ser van huneran zêde bikin. Ew bixê di berhema xwe de 13 hunerên din lê zanista bedî'ê zêde dike. Piştê Qudame b. Ce'fer (w. 337/948) di berhema xwe ya bi navê *Neqdu's-Şî'rê* de hinek hunerên din li bedî'ê zêde dike. Ebû Hîlal el-'Eskerî (w. 400/1009) di berhema xwe *Kîtabu's-Sin'eteyn* de 13 hunerên ku wî keşif kiriye dinasîne. İbn Reşîq el-Qeyrewanî (w. 456/1064) heft hunerên dîtir di berhema xwe de pênase dike. Tevî vê di navê huneran de guherîna çêdike. Weke ji *Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedî' re Tesdîr* dibêje. 'Usame b. Munqiz (w.584/1188) di *el-Bedî' fî Neqdi's-Şî'r* a xwe de cih dide 95 hunerên bedî'ê. İbn Ebi'l İsbâ' el-Misrî (w. 654/1256) di *Bedî' u'l Qur'anê* de heft hunerên dîtir lê zêde dike. Ji sedsala 7an ya hîcrî û pêve şa'iran dest bi nivîsîna şî'rên ku di wan de hemû hunerên zanista bedî'ê civandine dikin. Ji vê çûre şî'rê re *Bedî'iyat* dihê gotin. Sefiyuddîn el-Hîlalî/Hillî? (w. 749/1348) di şî'ra xwe *el-qafiyetu'l-Bedî'iyye fî'l-Medâihî'n-Nebewiyye* de ku 145 malik e 150 hunerên bedî'ê civandiyê. Şî'ra Zeynuddîn Şe'ban b. Muhememd b. Dawûd el-Asarî (w. 828/1424) *el-'Iqdu'l-Bedî' fî Medhi's-Şefî'* dirêjtirîn şî'ra bedî'iyye ye, ji 400 malikî pêktê û 240 hunerên bedî'ê di xwe de civandiyê (Hacimüftüoğlu, 2024; Aydın, 2018). Ji van agahiyên jor ev dihê bidestxistin ku hunerên edebî û hemû rêgezên dîtir yên edebiyatê weke teşeyên nezmê û mijarên teşeyan ne standart in. Her şa'irek li gorî zewq û qabiliyeta xwe, bi sûdwergirtina ji ziman û çanda xwe dikare guherîn û zêdahîyê li teşeyên nezmê û hunerên edebî bike.

⁷ Ji bo mulemme'ên edebiyata Kurdî ya klasîk û pênaseyên nûjenkirî bnr: (Ertekin&Yıldız, 2022)

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de ciyawaziyên ku dihê dîtin divê bi vî çavî li wan bê nihêrîn. Di pênasayên têgihan de taybetmendiyên şî'ra Kurdî divê li ber çav bê girtin, teşe û cureyên nezmê ji nuh ve bê senifandin û hunerên ku şa'irên me bi zewq û qabiliyeta xwe ava kirine li rewanbêjîyê bê zêde kirin.

Şêx Tahirê Şûşî, yek ji şa'irên edebiyata Kurdî ya klasîk e ku şiyaye di yek şî'rê de gelek hunerên edebî bicivîne û cureyên nuh ava bike. Şî'ra wî ya bi navê "Mûma Dilî" hem ji layê cureyên nezmê hem ji layê cureyên muweşşehan û hem ji layê hunerên edebî ve şî'reke resen e. Herçend ev şî'r beriya niha di kovaran de hatibe weşandin, di hinek xebatan de behs jê hatibe kirin jî nebûye mijara xebateke 'ilmî. Li ser hunerên wê û edebiyeta wê nehatiye rawestan. Armanca vê xebatê, vekolîna hunerên edebî yên sereke di şî'ra "Mûma Dilî" ya Şêx Tahirê Şûşî de ye.

Ev xebat ji destpêk, du beş û encamê pêk hatiye. Di destpêkê de em li ser tesîra ziman û çandê di guherîn û nûjeniya têgih, teşe û hunerên edebî sekinîne. Di beşa yekem bi kurtasî jiyana Şêx Tahirê Şûşî û serencama bidestxistina şî'ra wî ya bi navê "Mûma Dilî" hate dayin. Di beşa duyem de me ji layê hunerên edebî yên sereke ve şî'ra "Mûma Dilî" nirxand. Di encamê de hate dîtin ku Şêx tahirê Şûşî gelek hunerên edebî di şî'ra xwe de bi cih kiriye ku hinek ji van di berhemên rewanbêjîyê de kêr dihên dîtin û hinek ji wan hetanî neha nehatine dîtin. Di heman deme de cureyek li şî'ra muweşşeh zêde kiriye ku me navê "Muweşşaha Gul" lê danî.

1. Şêx Tahirê Şûşî û Serencama Şî'ra "Mûma Dilî"

Şêx Tahirê Şûşî, yek ji 'alim, şa'ir, nazim, edîb, xweşnivîs/xettat û mustensixê edebiyata Kurdî ye. Ji binemaleke navdar, 'alim û rewşenbîr bûye. Navê bavê wî Şêx Mehemed û navê bapîrê wî Şêx Tahir e. Di sala 1917an de li herêma Behdînan li gundê Şûşê ku dikeve navbera Dihok û Akreyê hatiye dinê (el-Şûşî, 2022).

Li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Paşê li gelek deveran li ber destê seydayên hêja û navdar xwendina xwe domandiye. Di sala 1947an de îcazeya 'ilmî ji Mela Ebdullahê Bêtwateyî wergirtiye⁸ (el-Şûşî, 2022). Piştî wergirtina îcazeya 'ilmî demekê li gundê Sîsîna ku girêdayî bi Akrê ve ye dest bi melatî û dersdayinê dike. Şêx Tahirê Şûşî tevî îcazeya 'ilmî icazeya xweşnivîsîyê/xetatîyê wergirtiye. Şêx Tahir bawernameya xweşnivîsîyê ji xweşnivîsên bi nav û deng Mehemed Tahirê Kurdî wergirtiye. Heşt salên dawî yên temenê wî bi nexweşiyê derbas dibe. Bi êşa weremê di sala 1962an de li nexweşxaneyê Bexdayê rehet dike. Cenazeyê wî li gundê Şûşê li goristana Şêx Şemseddînê Şûşî dihê veşartin (el-Şûşî, 2022, Salih, 2021).

⁸ Ji bo agahiyên berfireh derbarê medreseyan ku Şêx Tahir li wan xwendiyê û navê seydayên wî bnr: (el-Şûşî, 2022, Salih, 2021)

Şêx Tahirê Şûşî kesayetekî pir alî ye. Bêtir bi mesnewiya xwe, “Gulzar-Riyadu'n-Nûr” ê bê nasîn jî, helbest nivîsî ye, pend û şîret nivîsiye, dîrok nivîsiye, berhem şerh û te'lîq kiriye, tehqîqa berheman kiriye, xutbe nivîsandiye û gelek berhem îstînsax kiriye (el-Şûşî, 2022). Dema em berê xwe didin berhemên wî em têdigihêjin ku ji xeyrê zanistên dîni di gelek zanistên dîtir de jî xwe perwerde kiriye. Derbarê serwayê de berhem nivîsiye, berhemek li ser zanista ‘erûzê şerh kiriye, bi hunera xweşnivîsiya xwe gelek berhem nesx kiriye û herweha di cizûbendkirin û neqşkirina berheman de gelek mahir bûye.⁹ Dîsa ji berhemên wî xuya dibe ku bi Kurdîya Kurmancî û Soranî, ‘Erebî, Farsî û Tirkîya Osmanî baş dizani bû.


Weke li jorê me pê amaje kir, Şêx Tahirê Şûşî gelek berhemên edebî û ‘ilmî tehqîq kiriye. Yek ji van berheman dîwana Melayê Cizîrî (1570-1640) ye. Şêx Tahirê Şûşî dîwana Melayê Cizîrî bi xetên xwe yê ciwan tehqîq kiriye, neqîşandiye û gelek têbinî li ser nivîsandiye. Hevalê Şêx Tahirê Şûşî, Mela Tahayê Kovelî nusxeyek vê dîwanê bi hemû îşaret, zarav û têbiniyên Şêx Tahirê Şûşî ji bo xwe nivîsiye (el-Şûşî, 2013). Dîwana ku Şêx Tahirê Şûşî îstînsax kiriye ji bo çapkirinê digihêje destê Giwî Mukrîyanî (1904-1977). Ev nusxe wenda ye, nehatiye bidestxistin. Ev şî'r, "Mûma Dilî" tevî çend texmîsên Şêx Tahirê Şûşî li ser şî'rên Melayê Cizîrî di dawiya nusxeya Mela Tahayê Kovelî de nivîsandiye.¹⁰ Mela Tahayê Kovelî, şî'ra "Mûma Dilî" du caran nivîsiye. Carekê bi şîklê gulê û carekê jî bi şîklê şî'rê (malik li pey malike) nivîsiye (Doskî, 1989). Cara yekem şî'ra "Mûma Dilî" ji teref Muhsîn Îbrahîm Ehmed Doskî di sala 1989 an de di kovara Rewşenbîrên Nuyê de hatiye weşandin.

2. Taybetî û Hunerên Edebî yên Sereke di Şî'ra “Mûma Dilî” de

Şêx Tahirê Şûşî gelek hunerên edebî di şî'ra xwe de civandine. Ji bo taybetiyên hunerên edebî yên şî'rê bi zelalî bê famkirin divê pêşî em şî'rê û şêweya nivîsandina wê pêşkêş bikin.

⁹ Ji bo agahiyên berfireh derbarê xebatên Şêx Tahirê Şûşî bnr: (el-Şûşî, 2022)

¹⁰ Ev nusxe di arşîva taybet ya Tehsîn Îbrahîm Doskê de dihê parastin.



Weke li jor ji wêneyê xuya dibe Şêx Tahirê Şûşî şî'ra xwe di şiklê gulekê, kulilkekê de nivîsî ye. Her bergeke gulê, kulilkê malikeke şî'rê ye. Bi vî rengî gula deh belgî bûye şî'reke deh malikî.

Şai'rifî di nîveka gulê de herfa lamê (ل) bi cih kiriye. Ev herf di serê hemû malikan de û di dawiya hemû malikan de herfeke hevpar e.

Di navbera bergên gulê de sê herf stûr hatine nivîsîn. Ev her sê herfên stûr tevî herfa lamê ya nîveka gulê, herfên hevpar in di dawî û serê malikan de. Di vê rêbâzê de îstîsnayek heye. Her sê herfên stûr yên serê misraya malika yekem di dawiya misraya duyem ya malika dawî de dubare bûye.

Di dawiya bergên gulê de du herf stûr hatine nivîsîn. Ev herdu herfên stûr herfên hevpar in di dawiya misrayên yekem yên malikan ku bi Kurdî ne û di serê misrayên duyem yên malikan de ku bi 'Erebî ne.

Tespîta malika yekem ya şî'rê li gorî herfa lamê (ل) ya nîveka gulê û mexlesa şa'irî dihê kirin. Şairî navê xwe; "Tahir" weke mexles bikaraniye. Malika yekem ya şî'rê piştî malika mexlesê ye ku rûyê herfa lamê (ل) jî li wê malikê dinihêre.

Şi'r bi kêşa 'erûzê hatiye nivîsîn. Behra şî'rê tewîl, qalibê şî'rê *Fe'ûlun*, *Mefa'ilun*, *Fe'ûlun*, *Mefa'ilun/Mefa'îlu* ye.

Şi'r di eslê xwe de weke ji wêneyê jî diyar e bi herfên aramî hatiye nivîsîn. Ji bo agahiyên li jor hatin dayin bi zelalî werin famkirin divê em şî'rê bi 'Erebî binivîsîn.

ل مومأ دلئمن تازه شوعلك وه لئ هلبو	بُوِجِدِ أَلَيْمٍ مِّنْ حَبِيبٍ مُّجْتَلٍ
ل مجمر هوایی یاری بئی لطف وبئی میلی	لِیَبْكِي فُوَادِي بِالذَّمْعِ الْمُسْتَلِ
ل سلسالئی خون بر صفحه ئی رویی من سایل	يَلْوِخُ عَلَيْهَا زَسْمٌ حَبِ بِجَدْوَلٍ
ل و د جفایا من چو بولبول ب نالانم	نَمِوِجُ وَنَشْتَأُقِ لِأَزْهَارِ كَلْكَلٍ
ل گل گل قباییی نازکی من عجاییب دین	يَنْوِطُ عَلَي الْخَدَّيْنِ مِّنْ حَبِّ فَلْفَلٍ
ل فلفل دو خالی عنبرین بون و سیم بازو	زَوَائِبِهَا مِثْلُ الْخَرِيرِ الْمِفْتَخَلِ
ل تف مسکه وئ دئیم شهبی ماهی کوده صفا	فَأَحْسِنِ بَصْدَغٍ مِّنْ مَّثْنَى وَمُرْسَلِ
ل سر مل دخونن طوسی سر طاییی قد سروی	وَيُرْمِي سِهَاماً مِّنْ غَيُونٍ مُّكْجَلِ
ل حکیمی ته جانا دل جگر سوژ و غمناکم	كَمَا تُحْرِقُ النَّازِقُ الْقَضَى ثُمَّ تُنْجَلِ
ل جنت رحیقا وصلی طاهر فخور یک جام	أَمَانٌ وَتَسْلِيمٌ لِرَاجٍ وَشَوْمِئِلِ

Transkirîba şî'rê:¹¹

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
Bi wecdin elîmin min hebîbin mucemmelî¹²

Li mecmer hewayê yarê bê luţ û bê meylê
Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî¹³

Li selsalê xwûn ber şefheê rûyê min sayil
Yelûhû 'eleyha resmû hebîbin bi cedwelî¹⁴

Lew di cefaya min çu bulbul bi nalan im
Nemûcû we neştaqu li ezharî kelkelî¹⁵

¹¹ Weke ku dihê zanîn di elfabeya aramî de tenê herfên bêdeng bi tîpan dihên nivîsîn. Herfên dengdêr yên elfabeya latînî weke; î, i, û, e, ê di nivîsa 'Erebî de bi tîpan nayên destnîşankirin, bi herekeyan; fethê, kesre demme dihên nîşandayin. Herweha di elfabeya aramî de herfên di kelîmeyan de ducare dibin bi îşareta şeddeyê dihên diyarkirin, lê di transkrîbê de ducare dihên nivîsîn. Herfa Kurdî (ê) di elfabeya aramî de bi tîpa "y" dihê nivîsîn. Di transkrîba şî'rê de divê ev taybetiyên alfabea erebî û cudahiya elfabeya latînî li ber çavan bêne wergirtin. Herweha di transkrîba şî'rê de alfabea transkripsiyonê ya Îsnad Unîcode hat bikaranîn.

¹² Bi evîneke giran ji dîlberek xweşik.

¹³ Ji bo dilê min bi hêşiran li pêy hev bigîrî.

¹⁴ Resmê evînê bi cedwelê xuya dike li ser wê.

¹⁵ Em bi heyecanin û bi bêrî dikin wan gulên sîngê.

Li gulgul qebayê nazikê min ‘ecaîb dîn
Yenût û ‘ele’l-qed’deynî min hebbî felfelî¹⁶

Li fulful du halên ‘enberîn bûn û sîm bazû
Zewaîbûha mislu’l-herîr’l- mufettelî¹⁷

Li tev misk e wê dêm şubhê mahê ku de şefa
Fe ehsin bî şudxî min musna we mursalî¹⁸

Li ser mil dihwûnin tûtî ser tayê qedserwê
We yermî sîhamen min ‘uyûnin mukehhelî¹⁹

Li hukmê te cana dil cigersûj û xemnak im
Kema tehrîqu’-n-naru’l-xeđa summe tencelî²⁰

Li cennet rehîqa weşlê Tahir veşwor yek cam
Emanun we teslîmun lî racin we mûmilî²¹

1.1. Qit’eya Lamîye

Şi’ra "Mûma Dilî" bi teşeya qit’eyê hatiye nivîsîn. Qit’e ew teşeya nezmê ye ku misrayên duyem yên malikan hemserwa ne. Malika yekem ya qit’eyê ne muserre’ e, hemserwa ye (Fesayî, 1380; Değirmençay, 2014). Serwabendiya qit’eyan bi vî şiklî ye.

A -----B, C-----B, D-----B, E-----B, F-----B,

Ji aliyê teşeyên nezmê ve qit’eyeye asayî xuya bike jî du taybetiyên sereke yên vê şîrê wê ji qit’eyên dîtir vediqetîne. Taybiteyek jê ev e ku herfa serê hemû malikan bi lamê (L) dest pê dike. Li jêr emê li ser vê hunerê rawestin. Taybetiya duyem jî ev e ku herfa dawî ya malikan jî bi herfa lamê (L) diqede.

Weke ku dihê zanîn li gorî herfa rewîyê yanî li gor herfa dawî ya ku qafiyeyê teşkîl dike nav li qesîdeyan dihê kirin. Eger di qesîdeyê de herfa rewîyê lam (L) be *Qesîdeya Lamîye*, herfa rewîyê mîm (M) be *Qesîdeya Mîmîye*, herfa rewîyê nûn (N) be *Qesîdeya Nûnîye* dihê gotin (Humayî, 1373). Di berhemên rewanbêjîyê de di pênaseya lamîye, mîmîye û nûnîye de weha hatiye gotin: Ew qesîde yan jî perçeyeye şîrê ku herfa rewîya wê lam be *lamîye*, nûn be *nûnîye*, mîm be *mîmîye* dihê gotin (Ye’qûb, 1411). Di mînakên ku hatine dayin em dibînin

¹⁶ Ji hebên îsotan danî ser herdu dêman.

¹⁷ Di şibehe hevirmîşê kezîyên wê yên xelekî.

¹⁸ Xweşik bibe bi biskên belawela û du tayî.

¹⁹ Ji çavên kilkirî tîrekê diavêje.

²⁰ Wek agir kû xedayê dişewitîne paşê şîr dibe.

²¹ Emniyetek û teslîmîyetek ji kesê hêvîdar û hêviyan.

ku şî'ra ku malika yekem ne muserre' (hemserwa) e jî weke qesîde hatiye nasandin. Weke şî'ra Şenferî (Sabîb bin Uwes) ku bi vê malike dest pê dike: "Eqîmû benî ummî sudûre metîyyekum / Feînnî îla qewmin sîwakum liemyelû" (Ye'qûb, 1411, r. 388). Ev şî'ra Şenferî di berhemê de ji bo qesîdeyên lamiye weke mînak hatiye dayin. Di berhemên rewanbêjîyê yên Farisî de ji bo nasandina qit'eyan weha hatiye gotin: "Her qesîdeya ku malika metle'ê (malika yekem) ne muserre' (hermserra) be, eger çendîn dirêj be jî jêra qit'e dihê gotin" (Fesayî, 1380, Humayî, 1373). Li ser van agahiyan ji ber ku di şî'ra "Mûma Dilî" de herfa rewiyê lam (L) e em dikarin jê re bibêjin **Qit'eya Lamiye**.

1.2. Qit'eya Mulemme'

Di edebiyata Farsî, Tirkî û Kurdî de derbarê pênaseya mulemme'ê de çiyawazî hebe jî, bi pênaseyêke giştî; ew şî'r an menzûmeya ku herî kêr bi du zimana hatiye honandin mulemme' jê re tê gotin (Ertekin&Yıldız, 2022). Ji bo cureyên mulemme'an jî weha pênaseyek hatiye dayin: Eger zimanên di şî'rê de hatine bi kar anîn li gor rêbazekê, pîvanekê di şî'rê de cih girtibin ji wan mulemme'an re mulemme'ên hevîrtî (muretteb) dihê gotin (Ertekin&Yıldız, 2022).

Di şî'ra "Mûma Dilî" de, Şêx Tahirê Şûşî misrayên yekem yên malikan bi Kurdî û misrayên duyem yên malikan bi 'Erebî nivîsî ye. Ji ber ku şî'r bi du zimana hatiye nivîsîn qit'eya mulemme' e. Di heman demê de mulemm'eke du zimanî ye. Ji ber ku misrayên malikan yên yekem bi Kurdî û yên duyem bi 'Erebî ne û ev rêbaz di tevahîya şî'rê de hatiye bi kar anîn, ev şî'r mulemme'eke hevîrtî (muretteb) ye.

1.3. Qit'eya Muweşşeh: Muweşşeha Gul.

Tewşîh di ferhengan de bi gerdana kesekî ve hilawistina qayîşa şûr, ew tiştên ku bi mil û kêlekê ve tê hilawistin weke şûr û tiştên din, nivîşt û berbejna ku çeperast davêjin stûyê xwe (Dihxuda, 1377), jîna bejinzirav (eş-Şertûnî, 1403), xemilandin, xemilîn û xweşikkirin hatiye (Dad, 1385). Di edebiyatê de bêjeyêke rewanbêjîyê ye ku dikeve nava hunerîn bedî'ê yên bêjeyê (lefzî). Weke têgeheke edebî tewşîh, ew hunera edebî ye ku ji serî, nîvek an dawîya misra yan malikên şî'rê, menzûmeyê herfek an hinek herf an jî kelîme werin derxistin, ji wan herf an kelîmeyan navek, bernavek, gotineke pêşîyan, biwêjek, misrayek, malîkek an menzûmeyek dîtir bê bidestxistin (Değirmençay, 1998, Sebzwarî, 1396). Di edebiyatê de ji bo helbestên bi vê hunerê hatine nivîsin şî'ra muweşşeh hatiye gotin (Şemîsa, 1368). Û li gorî teşeyên nezmê nav li wan hatine kirin. Weke; Xezela Muweşşeh, Qesîdeya Muweşşeh, Qit'eya Muweşşeh (Wetwat, 1362). Weke ji pênaseyê dixuye di şî'ra muweşşeh de ji herf an kelîmeyan derxistina kelîme, hevok an misra-malîkek watedar weke merc hatiye behskirin.

Di dabeşkirina cureyên muweşşehan de muweşşehên mutesekkîl (Muweşşehên bi şîkil) cihêkî taybet digire. Muweşşehên mutesekkîl di nava xwe de bi Muweşşehê Mudelle' (Muweşşeha bi koşe), Muweşşeha Muteyyer

(Muweşşeha bi şiklê çivîkan), Muweşşeha Muşeccer (Muweşşeha di şiklê darê), Muweşşeha Murebbe' (Muweşşeha çar malikî), Muweşşeha Mudewwer (Muweşşeha girover) û Muweşşeha Mu'eqqed (Muweşşeha Girêkî) dihên dabeşkirin (Wetwat, 1362, Değirmençay, 1998, Sebzwarî, 1396). Di ev cure muweşşehan de xala girîng ev e ku ji şî'ra muweşşeh derxistina tişteki watedar ne merc e.

Şêx Tahirê Şûşî, bi hunereke mezin şî'ra xwe di şiklê gulekê, kulilkekê de nivîsiye. Ji bo ku endamên anatomiya gulê, kulilkê ji hevudû veneqetin, yek perçe bin, bi herfan bi hev girêda ye. Herfa lamê (J) ya nîveke gulê, kulilkê bûye mênaya²² gulê. Hersê herfên stûr yên li hember lame (J) belg û mênayê pevdigihîne. Bi du herfên stûr yên serên belgên gulê, kulilkê yek perçebûniya belgan hatiye bi dest xistin. Bi vî rengî, yekîtiya anatomiya gulê, kulilkê bi herfa hatiye avakirin.

Li ser ahgahiyên hatin dayin ev şî'ra Şêx Tahirê Şûşî ya bi navê "Mûma Dilî" **Qit'yeke Muweşşeh e**. Ev şî'r ji ber ku di dirûvê gulekê, kulilkekê de hatiye nivîsîn û hetanî niha (li gorî lêkolînên me) di edebiyata 'Erebî, Farsî, Tirkî de şî'rek bi vî rengî nehatiye nivîsîn. Lewma jî divê navek lê bê kirin. Em, ji bo vê şî'rê navê **Muweşşeha Gul** (Muweşşeha di şiklê gulê de) pêşniyaz dikin. Eger di pêşerojê de neyê peyitandin ku di edebiyatên neteweyên dîtir de beriya Şêx Tahirê Şûşî kesekî şî'rek bi vî rengî nivîsiye, avakerê ev cure muweşşehê (**Muweşşeha Gul**) Şêx Tahirê Şûşî ye. Bi gotineke din Şêx Tahirê Şûşî cureyeke muweşşehê li edebiyata klasîk zêde kiriye ku xasê edebiyata Kurdî ye.

1.4. Qelb

Qelb, yek ji wan hunera ye ku şa'iran gelekî girîngî dane wê. Qelb, di ferhengê de bi wateya berevajî ye. Weke têgihêkî edebî bi karanîna peyva ye ku herfên wan beravajiyê hevûdu bin (Humayî, 1373, Değirmençay, 2014). Gelek cureyên vê hunere hebin jî cureyên sereke qelba kull (berevajîya giştî) û qelba be'd (beravajîya kêr) e. Ji bo qelba kull bêjeyên weke; raz - zar, ceng - genc mînak in. Reqîb - qerîb, rehîm - herîm jî mînakên qelba be'd in (Humayî, 1373). Tu huner bi qasî hunera qelbê li cem erbabê qulûb nehatiye pejirandin. Lewra hunera qelbê quweta zihnî, taqeta afirandin û hêza fikrî ya şairî derdixîne holê (Sebzwarî, 1396). Ji ber vê jî qelbên bêjeyî bigirin hetanî qelbên hevokî û niv malikî di berhemana de dihên dîtin.

Di şî'ra "Mûma Dilî" de cureyên nuh yên hunera qelbê ku di berhemên rewanbêjîyê de cih nagirin dihên dîtin. Şêx Tahirê Şûşî, bi hunereke xurt sê cure qelb di şî'ra xwe de bi cih kiriye. Cureyek jê ev e; beravajîya bêjeya yekem ya şî'rê kiriye bêjeya dawî ya şî'rê.

أمانٌ وتَسْلِيمٌ لِرَاجٍ وَمُومِلٍ

ل موما دلچمن تازه شوعلك وهلى هلبو

²² Bi latîni; Ginekum, bi Tirkî; dişi organ, bi Farsî; madegiyê gul (مادگی گل) dihê gotin. Lêkolînerê çandmendiyê Iraj Moradi navê vê endama gulê weke "Mênaya gulê" bo me diyar kir.

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû (Misraya yekem ya şî'rê)

Emanun we teslîmun lî racin we **mûmilî** (Misraya dawî ya şî'rê)

Ji pênc herfên bêjeya yekem ya şî'rê (l, m, w, m) bi beravajî di bejeya dawî ya şî'rê de cih girtiye. Li vê tewafiqê binihêrin ku di nivîsa latîni de jî beravajîya bêjeya "li mûm" "mûmil" e

Cureya duyem ya qelbê ev e ku Şêx Tahirê Şûşî hinek herfên dawî yên bêjeyên misrayên duyem di serê misrayên yekem yên malikan da beravajî anîye.

ل مومما دلېمن تازە شوعلک وەلې هلبو
يوجد اليم من حبيب مجمل
ليبيكي فوادي بالدموع المسلسل
ل مجمر هوايى بارى بى لطف و بى ملبى

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû

Bi wecdin elîmin min hebîbin **mucemmelî**

Li mecmer hewayê yarê bê lutf û bê meylê

Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

Weke ji malikê dixuye herfên bêjeya dawî yên misrayên duyem beravajî di serê misrayên yekem yên malikan de cih girtiye. Û ev huner di hemû malikan de dihê dîtin.

Cureya sêyem û ya herî girîng ev e ku Şêx Tahirê Şûşî ev huner di navbera du zimanan de pêk anîye. Beravajîya peyvên 'Erebî di peyvên Kurdî de bi kar anîye.

1.5. Tekrar

Yek muhîmtirîn û grîngtirîn hunerên edebî di şî'ra "Mûma Dilî" de hunera tekarê ye û xasma tekrara herfa ye. Tekrar, yek hêmaneke bîngêhîn e di avakirina mûsîkiya derûnî (hundurîn) ya şî'rê de. Tekrar, di herfan de, di kîte, bêje û hevokan de eger li gorî pîvanekê bê bikaranîn tevî ku dibe sedema xweşikahîyê di heman demê de faktoreke girîng e ji bo ragihandina mebestê (Kedkenî, 1391). Şêx Tahirê Şûşî ji bo asta mûsîkiya şî'ra xwe bilind bike û ji bo dîtbariya şî'ra xwe ji çend cureyên tekarê sûd wergirtiye. Cureyên tekarê di şî'ra "Mûma Dilî" de weha dikare bîn dabeşkirin.

1.5.1. Rewde

Rewde ew hunera şî'rê ye ku (xasma di şî'ra 'Erebî de) herfa yekem ya malikê di dawîya malikê de dubare bibe (Ye'qûb, 1411). Yanî malik bi kîjan herfê dest pê bike bi heman herfê bi domahî bibe. Ev huner di tevahîya şî'ra "Mûma Dilî" de hatiye bi kar anîn. Hemû malikên şî'rê bi herfa lamê (ل) dest pê dikin û bi lamê (ل) bi dawî dibin.

1.5.2. Hemherfî (Alîterasyon)

Hemherfî (Sec', Alîterasyon) tekrara herfên bê deng e. Yek herfeke bêdeng an hin herfên bêdeng, çî li gorî pergalekê çî bêpergal, di hevok an malikekê de tekrar bibin hunera hemherfîyê ye. (Sadiqzade, 1390) Di misraya

yekem ya şî'rê de tekrara herfa lamê (J) pênc caran di pênc lefzan de mînaka vê hunere ye.

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû

1.5.3. Hemdengî (Asonans)

Hemdengî (Asonans) tekrara herfên dengdêr e (Talibî&Ferzende, 1396). Eger herfên dengdêr li gorî rêbazekê werin dubarekirin asta mûsîkiya şî'rê bilind dike (Nûzerî, 1395). Di şî'ra "Mûma Dilî" de di malika duyem de tekrara herfa Yê (ى) heft caran di, dawîya heft kelîmeyan de mînakeke xweşik e ji bo vê hunerê. (di latînzekirinê de herfa "Y" di kelîmeyên Kurdî de weke "ê" û di kelîmeyên 'Erebîde weke "î" xwuya dibin.)

Li mecmer hewayê yarê bê lutf û bê meylê

Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

1.5.4. Reddu's-sedrî 'ele'l-'Ecuz'i tevî Qelbê

Di eslê xwe de Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i û Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedrî tevî hemû cureyên xwe (şanzde cure hatine diyarkirin) yek ji cureyên tekrare ne, herçend ku di berhemên belaxetê de weke hunerên serbixwe hatibin nasandin jî.²³ Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i weha hatiye pênase kirin. Lefzek di dawîya malikê yan di dawîya hevoka pexşan de were û heman lefz bi 'eynê xwe yan jî bi lefzek ku dişibe wê (hunera cînasê) di serê malik an hevoka piştî xwe de dubare bibe, ji vê hunerê re Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i hatiye gotin (er-Razî, 1388, Humayî, 1373).

Li gorî pênaseyê, kelîme yan kelîmeyên dawîya malikê di serê malika pey xwe de divê werin dubarekirin. Şêx Tahirê Şûşî bi tevahî li gorî vê pênaseyê nemeşîya ye. Di şî'ra xwe de ev huner bi rengekî dîtir derxistiye holê. Çar harfên dawîya malikan beravajî kiriye û di serê malikên li pey xwe de bi cih kiriye.

يُوجَدُ الِيمُ مِنْ حَبِيبِ مُجَلِّلٍ
لِئِبْكِي فَوَادِي بِالْمُصَوِّعِ الْمُسْتَلْسَلِ

ل موما دلیمین تازه شوعلک وهلی هلبو
ل مجمر هوایین یارین بئ لطف و بئین میلسی

²³ Ji bo ku mijar bi zelalî bê fam kirin divê pêşî em pênaseya hinek têgehnan bikin. Weke ku tê zanîn malikê ji du misrayan pêk tê. Di termînolojîya şî'rê de ji misraya yekem ra Sedr (الصدر) û ji misraya duwem ra 'Ecûz (العجز) dihê gotin. Ji beş (Tef'île) an kelîmeya yekem a misraya yekem ya her malikê re Sedr, û ji beş an kelîmeya dawî ya misraya yekem a her malikê re 'Erûz dihê gotin. Ji beş an kelîmeya yekem a misraya duyem ya her malikê re İbtîda, û ji beş an kelîmeya dawî ya misraya duyem a her malikê re Derb an 'Ecûz dihê gotin. Ji beşên (tef'île) di navbera wan de Heşûw hatiye gotin. (Humayî, 1373, 'Usman, 2004, Tural, 2011) Em van têgehnan li ser malika yekem ya şî'ra "Mûma Dilî" tetbîq bikin.

Malik (Beyt)				Bi wecdin elîmin min hebîbin mucemmelî			
Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû (Sedr)				Bi wecdin elîmin min hebîbin mucemmelî ('Ecûz)			
Li mûma	dilê min ta	ze şu'lek	welê hil bû	Bi wecdin	elîmin min	hebîbin	mucemmelî
Fe'ûlun	Mefa'îlun	Fe'ûlun	Mefa'îlun	Fe'ûlun	Mefa'îlun	Fe'ûlun	Mefa'îlun
Sedr	Heşuw	Heşuw	'Erûz	İbtîda	Heşuw	Heşuw	Derb / 'Ecûz

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
Bi weccdin elîmin min hebîbin **mucemmelfî**

Li mecmer hewayê yarê bê lutf û bê meylê
Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

Xaleke din jî ev e ku ev beravajîya herfan di navbera du kelîmeyên ziman cuda de (**mucemmelfî** - **Li mecmer**)pêk hatiye. Şêx Tahirê Şûşî, herfên kelîmeyên 'Erebî beravajî kirî ye û di destpêka kelîmeyên Kurdî de wan bi cih kiriye. Û ev rêbaz di tevahîya şî'rê de dihê dîtin.²⁴

1.5.5. Reddu's- sedrî 'ele'l-îbtîda

Ji tekrara yek an du bêjeyên dawî yên misraya yekem di destpêka misraya duyem de *Reddu's- sedrî île'l-îbtîda* hatiye gotin (Nûzerî, 1395, Sadiqzade, 1390). Di eslê xwe de ev huner cureyek e ji şanzde cureyên Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedrî.

Weke li jor me pê amaje kir, Şêx tahirê Şûşî ji bo yekîtiya endamên gulê ava bike di serê belgên gulê de bi du herfan belg sergîhayî kiriye. Ev herdu herf, dibin herdu herfên dawî yên misrayên yekem ku bi Kurdî ne û dibin herdu herfên destpêka kelîmeyên yekem yên misrayên duyem ku bi 'Erebî ne.

بوجد اليم من حبيب مجمل
لبكي فؤادي بالدموع المستسل

ل موما دلیمین تازه شوعلک وهلی هلبو
ل معجر هوایی یاری بی لطف و بی میلی

Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû
Bi weccdin elîmin min hebîbin mucemmelfî

Li mecmer hewayê yarê bê lutf û bê meylê
Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî

²⁴ Pêkan e ku sernavê binbeşê, *Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i tevî qelbê* bale bikişîne û bibe sebebe îtirazê. Lazim e li vir em du xala zelal bikin. Xalek jê ev e ku di berhemên edebiyata Farsî de hunerek bi navê *Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedrî me'e'l-Qelb* hatiye nasandin. Ji bo vê hunerê jî ev malik mînak hatiye dayin: (Fesayî, 1380)

Ma ra çu serê zulfê to borde est **aram**
Ma ra mezen û ba men miskin şew **ram**
Darem tem'ê weslê to ey eslê **murad**
Ma der kûyet nemande îm ender **dam**

Weke ku dihê dîtin lefzên serê misrayan di dawîya misrayan de beravajî hatiye nivîsîn (ev jî ji şazdeh cureyên vê hunere cureyek e). Ev jî balkêş e ku di misraya duyem ya malika yekem de lefzên “Ma ra” di dawîya misrayê de bi herfeke kêma “mar” beravajî hatiye nivîsîn. Di misraya duyem ya malika duyem de lêvzên “ma der” di dawîya misrayê de ne di temamê lefzan de, di herfên lefzê de “ender **dam**” bi beravajî hatiye nivîsîn. Eger *Reddu'l-'ecuz'i 'ele's-sedrî Me'el Qelb* hebe çima *Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i tevî Qelb* tunebe? Ji ber vê me ev sernav lê danî

Xala duyem jî ev e. Şêx Tahirê Şûşî, bi hêza xwe, bi qabiliyeta xwe, bi zewq û selîqeya xwe hunerek ava kiriye. Divê navek li vê hunere bê kirin. Me li gorî zanebûna xwe navê *Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i tevî Qelb* lê danî. Lê eger edebiyatzanên me bixwazin navekî dîtir lê deynin, em li bende pêşniyarên wan in.

Her çend ku ev huner ne di tevahîya kelîmeyê de, di du herfên kelîmeyê de derketibe holê jî, ji ber ku nêzî hunera *Reddu's- sedrî île'l-îbtîda* yê ye me ev nav lê danî.²⁵

Encam

Şêx tahirê şûşî, yek ji 'alim, şa'ir û nazimê edebîyata Kurdî ya klasîk e ku di sedsala XXan de jiya ye. Ji şî'rên xwe bêtir bi mesnewiya xwe ya Gulzarê hatiye nasîn. Tevî ku xwedî mesnewiyeke xweser e di heman demê de di şî'rê de di avakirina hunerên edebî de jî di edebiyata Kurdî ya klasîk de xwedî cihêkî taybet e.

Şî'ra "Mûma Dilî" ya Şêx Tahirê Şûşî herçend weke qit'eyeke asayî xwuya bike jî, ji ber ku gelek hunerên edebî yên nuh di xwe de bi cih kiriye şî'reke resen e di edebîyata Kurdî ya klasîk de. Lewra Şêx Tahirê Şûşî qit'e ya xwe bi çendîn taybetî û hunerên edebî yên nuh honadiye ku wê ji qit'eyên dîtir cuda dike.

Ji layê şikil ve dema em li vê qit'eyê dinihêrin em sê taybetiyên sereke dibinin. Yek jê qit'eyeke lamîye ye. Ya duyê qit'eyeke mulemma'a du zimanî û hevgeriya. Taybetiya sêyem û ya herî girîng ev e ku ev qit'e di heman demê de qit'eyeke muweşşeh e. Şêx Tahirê Şûşî muweşşeha xwe di şiklê gul/kulîlkekê de nivîsandiye ku li gorî lêkolînên me hetanî niha di tu berheman de nehate dîtî. Bi gotineke din Şêx Tahirê Şûşî cureyek muweşşehê li edebiyata klasîk zêde kiriye. Ji ber vê Şêx Tahirê Şûşî weke avakerê *Muweşşeha Gul* dikare were nasandin.

Hunera qelbê hunerek dîtir e ku Şêx Tahirê Şûşî di şî'ra xwe de bi çend renga jê sûd wergirtiye. Xasma herfên serê bêjeya yekem ya şî'rê bi beravajî di dawîya bêjeya herî dawî ya şî'rê de bikaranîneke resen e. Me pênase û mînakên vê hunere di berhemên rewanbêjiyê de nedît. Ji ber vê pêdivî bi navlêkirina vê hunerê heye.

Tekrar hunereke dîtir ya revanbêjiyê ye ku Şêx Tahirê Şûşî di "Mûma Dilî" de du cure lê zêde kiriye. Pêşî divê were gotin ku hunera rewdeyê kêr di hê nasîn û kêr şa'ira di şî'rên xwe de cih dane vê hunere. Em di "Mûma Dilî" de vê hunerê dibinin. Herweha em cara yekem di şî'ra "Mûma Dilî" de du hunerên tekrarê dibinin ku yek jê me bi navê *Reddu's-sedrî 'ele'l-'ecuz'i tevî Qelb* û ya din jî me bi navê *Reddu's- sedrî île'l-îbtîda* nasand.

Ji vê xebatê ev derkete holê ku edebîyata Kurdî ya klasîk xwedî taybetiyên cîyawaz e û pêwîst e li gorî cîyawaziyên wê teşeyên nezmê werin tesbîtîkirin, werin binavkirin û têgihên edebî werin pênasekirin. Şêx Tahirê Şûşî yek ji şa'irê edebîyata Kurdî ya klasîk e ku avakerê cureyên nezmê û hunerên edebî ye.

²⁵ Heman têbinîyên ku me li jor anî ziman ji bo vê bînbêşê jî derbasdar e.

Çavkanî

- 'Usman, M. B. (2004). *el-Murşidu'l- wafî fi'l 'Urûdî we'l -qewafî*. Beyrût-Lubnan: Daru'l Kutûbi'l 'Ilmîyye.
- Aydın, M. (2018). *Arap Dili Belagatında Bedî' İlmi ve Sanatları*. İstanbul: İşaret Yayınları.
- Dad, S. (1385). *Ferhengê Istilahatê Edebî*. Tehran: Întişaratê Murwarîd.
- Değirmençay, V. (1988). *Tevşîhât*. Erzurum: Atatürk Üniversitesi Fen Edebiyat Fakültesi Yayını.
- Değirmençay, V. (2014). *Fünûn-i Belâgat ve Sinâât-ı Edebî*. Ankara: Aktif Yayınevi.
- Dihxuda, 'E. E. (1377). *Loxetnameê Dihxuda*. Tehran: Danişgahê Tehran.
- Doskî, M. Î. (1989). *Pênc Hozan di Destxeteka Pir Beha Da*. Rewşenbîrê Nuyê, Jimare 124, 72-83.
- el-Şûşî, H. T. (2022). *eş-Şeyx Tahir Şûşî ve Tewsîqatihî El-medûnetî 'Ela Mextûtatihî. El-Mecelletu'l-'Ilmîyyetî lî Camî'etî Cîhan-Es-Suleymanîye*, 298-319.
- el-Şûşî, H. T. (213). *Feqetiya Şêx Tahirê Şûşî Li Mizgeftan û Berhemekê Berçav. Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslâmî İlimler (Uluslararası Sempozyum) (s. 646-677)*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- er-Razî, Ş. M. (1388). *el-Mu'cem Fî Me'ayîri Eş'ari'l-'Ecem*. Tehran: Neşrê 'Ilm.
- Ertekin&Yıldız, M. Z. (2022). *Govenda Zimanan; Mulemme'*. Van: Lorya.
- eş-Şertûnî, S. E. (1403). *Eqrebu'l-mevârid*. Qûm-Îran: Mektebetû Ayetu'l-lahi'l-'uzma el-mur'esî en-necefi.
- Fesayî, M. R. (1380). *Enwa'ê Şi'rê Farsî*. Şîraz: Întişaratê Nuwêd.
- Hacımuftuoğlu, N. (2024, 25 07). *Bedî'*. TDV İslâm Ansiklopedisi: <https://islamansiklopedisi.org.tr/bedi-belagat> adresinden alındı
- Humayî, C. (1373). *Funûnê Belaxet û Sina'atê Edebî*. Qûm, İran: Çapxaneê Stare.
- Kedkenî, M. R. (1372). *Suwerê Xeyal Der Şi'rê Farsî*. Tehran: Întişaratê Agah.
- Kedkenî, M. R. (1391). *Musîkiyê Şi'r*. Tehran: Agah.
- Me'în, M. (1381). *Ferhengê Me'în*. Tehran: Întişaratê Adîna.
- Nûzerî, E. (1395). *Nigahî be Berresiyê Arayeê Tekrar Der Şi'rê Qeyser Emînpûr. Mecmû'eê Meqalatê Yazdehemîn Humayişê Beynel Mîlelî (s. 1925-1941)*. Gîlan: Danişgahê Gîlan.
- Sadiqzade, M. (1390). *Berresiyê Karbordê Enwa'ê Tekrar Der Eş'arê Gulçîn Me'anî. Fesilnameê Tehqîqatê Te'lîmî û Xînayîyê Zeban û Edebê Farsî Danişgahê Azad İslam*, 61-84.
- Salih, B. A. (2021). *Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962) Di Edebiyata Kurdî de. Teza Lîsansa Bilind Neçapbûyî*. Van: Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê Enstituya Zimanên Zindî Makezanista Çand û Zimanê Kurdî.
- Saraç, Y. (2017). *Klasîk Edebiyat Bilgisi; Biçim-Ölçü-Kafiye*. İstanbul: Gökkuşbe.
- Sebzwarî, K. M. (1396). *Bedayî'u'l-efkar Fî Senayî'i'l-eş'ar*. Tehran: Neşrê Merkez.
- Şemîsa, S. (1368). *Nîgahî Taze be Bedî'*. Tehran: Întişaratê Firdews.
- Şemîsa, S. (1385). *Seyrê Xezel Der Şi'rê Farsî*. Tehran: Întişaratê Firdews.
- Şemîsa, S. (1374). *Seyrê Rûba'î Der Şi'rê Farsî*. Tehran: Întişaratê Firdews.

- Talibî&Ferzende, E. B. (1396). Berresiyê Enwa'ê Tekrar Karkirdhayê An Der Wîs û Ramîn. *Neşrîyeyê Finûnê Edebî*, Dewre: 9, Şomare: 3, Peyapey: 20, 27-42.
- Tural, H. (2011). *Arap Edebiyatında Arûz*. İstanbul : Ensar Yayınları.
- Wetwat, R. (1362). *Hedaîqu's-sihr fî deqâiqi'ş-şi'r*, Musehhih: 'Ebas Îqbal. Tehran: Kutupxaneê Tehûrî.
- Ye'qûb, E. B. (1411). *el-Mu'cemu'l-mufessel fî 'ilmi'l-'erûz ve'l-kâfiye ve funûni'ş-şi'r*. Beyrût: Daru'l-Kutûbu'l-İlmîyye.
- Zerrînkûb, 'E. (1361). *Neqdê Edebî*. Tehran: Emîr Kebîr.